

# Girtiyan biryariya xwe ragihand

*ÇALAKIYA* greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger a ku hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê Leyla Guven li Girtîgeha Tîpa E ya Amedê ji bo rakirina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daye destpêkirin, ket roja xwe ya 46'an. Parêzerên Guven ragihandin ku rewşa Guven giran bûye lê Guven bi biryar e ku heya dawî bi van daxwazên wê bên qebûlkirin çalakiya xwe bidomîne.

*LI GELEK* girtîgehan û li Strasboûrgê ji bo rakirina tecrîdê greva birçîbûnê ya bêdem dewam dike. Girtiyan der barê berxwedana xwe de name şandin û dan zanîn ku dê bi komên nû tev li berxwedanê bibin û wiha gotin: "Em dibêjin ku yan em ê tecrîdê bişikînin, an em ê tecrîdê bişikînin. Tu rêyek din tune ye. Em bi biryar in ku heya dawiyê biçin."... RÛPEL - 3

@rojname

23 Kanûn - Yekşem 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 213

## AKP DAIŞ'a siyasî ye



Endama Koordinasyona PAJK 'ê Ronahî Serhed diyar kir ku AKP, DAIŞ'a siyasî ye û wiha got: "Navê AKP'ê yê din DAIŞ'a siyasî ye. Divê gelê kurd li hemberî gefên Erdogan serferber bibe. Berxwedana gelan çawa ku di dîrokê de şoreş pêk anî, ev roj jî ew roj e." Serhat da zanîn ku berxwedana jinan dê hemû komployan têk bibe... RÛPEL - 2

# ŞÎFREYÊN SERKEFTINÊ

### LI DIJÎ HEBÛNA KURDAN

Dewleta tirk dibêje ku ew ê bikevin rojavayê Kurdistanê. Hinceta wan ew e ku li rojavayê Kurdistanê pergaleke demokratîk a kurdan tê avakirin. Hêzên ku digotin 'Em koalîsyona li dijî DAIŞ'ê ne', li hemberî gefên li dijî Rojava careke din xuya bû ku tu bawerî bi van hêzan nayê. Ji bo van hêzan tu nirxeke exlaqê siyasî, wijdan, heqaniyet û wefayê nîne. Ji bo wan a girîng, tenê berjewendiyên wan in.

### HEVSENGIYÊN MODERNÎTEYÊ


Ger em li gorî nêzikatiya diyardeyî, pozîtîvîst û formel a hêzên serdest li hêzan nenihêrin, pergala dewletê ya 5 hezar salî, li Rojhilata Navîn ku hevsengiyên modernîteya kapîtalîst û şerê sar ê 200 salî êdî îflas kiriye dê hêzên xwedî hişmendiya neteweya demokratîk, civakparêz, azadî û demokrasiyê teqez bi ser kevin. Şîfreya serkeftinê berxwedan e, berxwedan e û berxwedan e... *Nivîsa Salih Cûma Pîr / R.3*




## Dê dagirkerî hilweşe

**Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê der barê biryara DYA'yê ya vekişîna ji Sûriyeyê de daxuyaniyeke nivîskî da û wiha got: "Bi biryara vekişîna DYA'yê ya ji Sûriyeyê derketiye holê ku êrîşa dewleta tirk a li ser rojavayê Kurdistanê û bakurê Sûriyeyê komployek e û parçeyek ji lîstikê ye. Bi hevsengiyên nû wê dagirkerî were hilweşandin." KCK'ê di daxuyaniya xwe de PDK hişyar kir û got ku ger PDK were lîstikên Tirkiyeyê dê têk biçe...**


R3



## Ji ber kurdî axivî hat kuştin

Li Sakaryayê bav û kurê xwe yekşema borî ji ber kurdî axivîbûn rastî êrîşê hatibûn. Bav Kadîr Sakçi (43 salî) ku bi giranî birîndar bûbû, jiyana xwe ji dest da. Kurê wî yê 16 salî Burhan Sakçi hê jî li nexweşxanê tê dermankirin...


RÛPEL 3



## Mala xelkê kirine qereqol

Leşker û cerdevanên ku 16 roj in li gundikê Mala Evdo Heşkê Bît a gundê Nedarê ya Pasûrê bi cih bûne, mala gund ji xwe re kirine qereqol. Welatiyên ku li dijî vê neheqiyê serî li rayedaran dan, diyar kirin ku tu bersiv negirtine.

RÛPEL 3



## Aqûbeta Îsmaîl Bahçecî pirsîn

Dayikên Şemiyê bi armanca winda bên dîtin kujer bên darizandin di hefteya 717'an de xwestin li Qada Galatasarayê daxuyaniyê bidin çapemeniyê lê polîsan destûr neda. Dayikan vê hefteyê aqûbeta Îsmaîl Bahçecî pirsî...

RÛPEL 3

### Dê Erdogan negihîje armanca xwe...

R2

# Ji bo careke din dubare nebe



Li Gurgumê di navbera 19-24'ê kanûna 1978'an de li dijî welatiyên elewî komkujî pêk hat û li gorî daneyên fermî 111 elewî ji aliyê hêzên nijadperest û dewletê ve hatin qetilkirin. Bi boneya 40'emîn salvegera komkujiya Gurgumê bi tevlêbûna komeleyên elewî û xizmên kesên hatine qetilkirin li Cemxaneya Taxa Yorukselimê merasimek hat lidarxistin. Li dijî qedexeya walîtiya Gurgumê merasîm hat lidarxistin. Polîsan tax dorpêç kir û destûr nedan ku xebatkarên çapemeniyê bernameyê bişopînin. Di merasîmê de hat gotin ku ji bo careke din komkujî pêk neyên û êş dubare nebin li vir in. Girseyê piştî bernameyê qurnefîl danîn ber deriyê cemxaneyê. Di bernameyê de Gazî Metin, wiha got: "Her sal dema em tên bernameyê li pêş me barîkat tên avakirin. Lê em nayên ku canan bişewitînin. Em nayên canan bistînin. Em tên kesên can dane bi bîr bînin. Em dê her sal bên wan li vir bi bîr bînin." Piştî axaftinê semah gerandin.

www.arsivakurdi.org



## Jinên li Bordeaûx û Toûloûseyê name ji Guven re şandin

**TOÛLOÛS -** Hevseroka KCD û parlementera HDP'ê Leyla Guven ji bo rakirina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ev 46 roj in di çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ye. Ji bo Guven çalakiyên piştgiriyê jî didomin. Li bajarê Bordeaûxê yê Fransayê Komuna Jinan a Avesta Xabûr û Komîsyona Jinan a Toûloûseyê kart ji Leyla Guven re şandin. Jinan peyama 'Em bi te re ne Leyla Guven' da û diyar kir ku dê çalakiyên wan ên piştgiriyê heta dawiyê bidomin.

# Berxwedana jinê dê hemû komployan têk bibe

**Endama Koordînasyona PAJK'ê Ronahî Serhed bal kişand ser tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û wiha got: "Wê berxwedana jinan hemû planên komplogeran têk bibe. Berxwedana gelê kurd bûye malê hemû mirovahiya rasteqîner."**



Endama Koordinasyona PAJK 'ê Ronahî Serhed bû mêvana bernameya Rojeva Jin a Stêrk TV û behsa girîngiya yekbûna gelê kurd, tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û berxwedana hevseroka KCD'ê Leyla Guven kir.

Serhed diyar kir ku dê hêzên dagirker di hêrsa gelê kurd de bifetisin û wiha got: "Tecrîda heyî rastiya pêvajoyê dide nîşandan. Bêdengkirina Rêbertiyê kûrkirina tecrîdê ye. Her kêliyên têkoşîna gelê kurd xwestin dorpêç bikin. Di serî de jî hêzên ku ev komplo saz kirine ser neketine û wê bi ser jî nekevin. Ji ber ku Rêbertiya me çareserî xwest û hêza çaraseriyê dide avakirin, ji bo vê yekê dibe hedef. Ji ber ku di tevahî herêmê de û di nava gelan de siyaseta çareseriyê dide avakirin û pêşengiya wê dike. Ji bo vê yekê jî dibe hedefa hêzên dagirker. Dixwazin bi vê tecrîdê encam bigirin. Lê belê gelê me li hemberî wan bêdeng nema û ev 20 sal in li hemberî vê tecrîdê têkoşînek mezin didin meşandin. Têkoşîna gelê kurd her ku diçe mezin dibe û di sînorê gelê kurd de namîne, dibe malê hemû mirovahiya rasteqîner."

Di axaftina xwe de Serhed destnîşan kir ku hêzên desthilatdar her roj planên nû li ser gelê kurd çêdikin û divê kurd li hemberî van planên qirkirinê hêza xwe ya têkoşînê ava bikin.

**'Ev ne çalakiya mirinê ya jiyînê ye'**

Di berdewamê de Serhed bal kişand ser çalakiyên grevên birçîbûnê yên bêdem û bêdorveger û diyar kir ku dê berxwedana jinan planên hemû komplogeran têk bibe û wiha domand: "Çalakiyên ji bo grevên birçîbûnê li hemberî tecrîdê serîrakirin e. Ev çareserî jî gel bi hêza xwe û îradeya xwe ve bi rê ve dibe. Ev hêza berxwedanê belavî hemû parçeyên Kurdistanê û derveyê Kurdistanê bûye. Bêguman niha jiyana Leyla Guven ketiye xeteriyê ev ji bo dewleta faşîst ya tirkan hişyariyek pir mezin e. Di vê çalakiyê de parastina jiyan, azadî û hebûna xwe heye. Ev ne çalakiya mirinê ye ev çalakiya jiyînê ye. Heta ku encam bên girtin divê çalakî berdewam bikin."

**Gef li ser tevahî Kurdistanê heye**

Endama Koordinsayona PAJK' ê Ronahî Serhed destnîşan kir ku CPT berpirsiyar e û divê sextekariyê neke û ev nirxandin kir: "Heger pêk neynin, wê gelê me pêk bîne. Heger ku jiyan ji kurdan re nîne ji tu kesî din re jî nîne. Dahatuya hemû civak û kurdan êdî bûye yek. Şer çiqasî gerdûnî be ewqasî jî herêmî ye. Divê rastiya Kerkûkê neyê jibîrkirin. Çawa ku Kerkûk di rojekê de çû ew gef li ser Silêmaniyê, Helepçe, Hewlêr û tevahiya Kurdistanê jî heye. Qedera Hewlêr, Silêmanî, Kobanê, Amed û rojhilatê Kurdistanê bûye yek. Ji bo ku kurd di van êrîşên gerdûnî de neperçiqin divê yekbûna xwe ava bikin. Gefên dewleta tirk li ser başûrê Kurdistan jî hene. Erîşên li ser Lêlîkanê ne tenê ji bo PKK'ê ye. Di vê tasfiyeyê de tenê PKK zirarê nabînê tevahî Kurdistan wê bibîne."

**AKP DAIŞ'a siyasî ye**

Her wiha Serhed bal kişand ser gefên Erdogan ên dagirkirina bakur û rojhilatê Sûriyeyê û wiha bi dawî kir: "AKP ne partiyeke siyasî ye, ew bloka faşîzmê ye. Hemû kirêtan di nav xwe de dihewîne. Navê AKP'ê yê din DAIŞ'a siyasî ye. Divê gelê kurd li hemberî gefên Erdogan serferber bibe. Berxwedana gelan çawa ku di dîrokê de şoreş pêk anî, ev roj jî ew roj e. Faşîzma Erdogan dê hilweşe û were darizandin." ***BEHDÎNAN***

# Jinên Hesekê: Dê Erdogan negihîje armanca xwe



Endamên Rêveberî û hemşîreyên Nexweşxaneya Ş. Lêgerîn a li Hesekê bertek nîşanî gefên Erdogan ên li dijî bakur û rojhilatê Sûriyeyê dan û gotin ku çi dibe bila bibe dê nehêlin zîhniyeta faşît û dagirker lingê xwe biavêje ser axa wan.

Endama Rêveberiya Nexweşxaneya Ş. Lêgerîn Şêrîn Îsmayîl diyar kir ku Erdogan bi gefên xwe yekitiya gelan hedef digire û wiha got: "Di şoreşa rojavayê Kurdistanê de gavên girîng û berbiçav hatin avêtin, êdî ferq û cudahî ji holê hate rakirin û yekitî û wekhevî hate avakirin. Lewma Erdogan wekheviya gelan hedef digire û naxwaze hemû gel di nava aramiyê de bijîn. Em ê li dijî gefên Erdogan heta dawiyê xwe biparêzin."

Hemşîre Nûhat Mistefa jî ev tişt anî ziman: "Em wekî Heyva Sor û Nexweşxaneya Ş. Lêgerîn ji hemû rengên êrîşan re amade ne, bi hemû derfetên xwe em ê bi gelê xwe re bibin alîkar. Erdogan dixwaze tevahî Rojhilata Navîn dagir bike. Lê em ê li dijî vê zîhniyetê her li ser pêya bin. Pêwît e li dijî gefên Erdogan seferberiyek hevpar bê kirin. Em ê têbikoşin û dê Erdogan negihîje armanca xwe." ***HESEKÊ***

## Meclisa Jinan: Em ê ax û gelê xwe biparêzin

Meclisa Jinên Sûriyeyê têkildarî gefên Tirkiyeyê yên li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê daxuyaniyek da û banga guftûgoyên niştimanî di navbera hemû aliyên Sûriyeyê de kir ku dikaribin planên li dijî herêmê têk bibe.

Meclisê diyar kir ku gefên dewleta tirk ku şer gur dikin û herêmê ber bi karîseteke mezin ve dibe û ev yek ji bo şêniyên herêmê dibin cihên fikaran û wiha got: "Wekî jinên Sûriyeyê em ê parastina xaka xwe bikin, parastina gelê Sûriyeyê bikin. Yê ku rêya serkeftinê nîşan kiriye û teror têk biriye wê ji bo parastina bi rûmet lewaz nebe. Careke din em bang li hêzên niştimanî dikin ku rê li ber fitne û tevliheviyê bigirin û gavên ber bi pêvajoya siyasî bavêjin da ku bigihîjin yekitiyê û planên li dijî erdîngariya me tên kirin têk bibin. Her wiha wekî jinên Sûriyeyê em bi nasnameya xwe bawer in, hêviyên me gelê me ye. Em di wê baweriyê de ne ku gelê dê li hemberî hemû metirsî û astengiyan bisekinin û welat ber bi aramiyê ve bibe." ***QAMIŞLO***

## Bi krîzê re tundiya li ser jinan jî zêde bû



Endama Lijneya Rêveberiya Navendî ya MYK'a ESP'ê Sadiye Ok der barê krîza aborî de nirxandin kir û diyar kir ku modernîteya kapîtalîst xwe dispêre krîzê û ji ber vê jî pergalek li ser binpêkirinê hatiye avakirin.

Ok da zanîn ku AKP bi krîzek cidî re rû bir û hatiye û hêjî bi israr dibêje krîza aborî tuneye û wiha got: "Lê bêguman ev derew e. Welatî nikarin fatureyên xwe, deynê krediyên xwe bidin. Gelek bazirganî dikanên xwe girtin. Mirov nikarin hewcedariyên xwe pêk bînin. Bi taybetî jin li bazaran nikarin tiştekî bikirin. 2 kîlo firingî bûye 10 TL. Ji sedî 90 bihayê firingiyan zêde bûye."

Di axaftina xwe de Ok destnîşan kir ku krîza aborî tê wateya ku jin dê betal bimînin û wiha domand: "Ji ber krîzê gelek dikan tên gitin. Jin û mêrên li van deran dixebitin betal dimînin. Jin hepsê malê tê kirin, mêrên di alî aborî de pirsgirêkê dijîn jî berê xwe didin jinan. Ev jî tê wateya ku tundiya li ser jinê zêdetir dibe. Ji ber vê jin hem di alî aborî de hem jî di alî derûnî de du caran mexdur dibin."

Her wiha Ok anî ziman ku Tirkiye di îstîhdama jinan de li cîhanê di rêjeya 131'emîn de ye û got ku îstîhama jinê ji sedî 20 e. ***WAN***



## Piştî koçberiyeke dirêj vegeriya warê xwe

Li Dêrsîmê bi hinceta 'terorê' heta îro gelek zext li welatiyan hatine kirin. Di encama zextên hatin kirin de bi hezaran kes neçar man warê xwe berdin û biçin metropolên Tirkiyeyê. Sakîne Yildiz (Çakke) û malbata wê jî di 1984'an de ji ber zextan koçî Stenbolê kirine. Yildiz bandora polîtîkayên şer ên li ser wê nirxand.

Yildiz destnîşan kir ku piştî darbeya 1980'an her tim bi ser gundê wan de hatiye girtin û wiha got: "Ez zû zewicîm. Wê demê hevjînê min xwendekarê lîseyê bû. Em neçar man koç bikin. Me her tim çand, ax û baweriya xwe ji zarokên xwe re got. Lê dîsa jî li bajarên cuda mezin dibin, çand û ziman baş nizanin."

Di axaftina xwe de Yildiz da zanîn ku ji ber nasnameyên xwe yên bawerî û çandî gelek zehmetiyan kişandine û wiha domand: "Zarokên min nasnameya xwe vedişartin û diçûn dibistanê. Di 1994'an de dema em li Stenbolê bûn gund hatin valakirin. Hemû xizmên me ji gund hatin derxistin û koçkirin. Kal û pîr neçarî jiyana xurbetê bûn. Bi hesreta axa xwe jiyana xwe ji dest dan. Tevî ku tiştek tunebû jî bi gotina terorê gund vala kirin."

Her wiha Yildiz diyar kir ku piştî demek dirêj li ser projeya 'vegera gundan' biryar dane ku vegerin gundê xwe û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Em di 2014'an de vegeriyan gundê xwe. Niha em 6-7 mehan tên gundê xwe dimînin. Em bostan diçînin. Em bi rez û baxçeyan re mijûl dibin. Em xwarina xwe ya zivistanê ji vir dibin lê wek berê aramî tune ye. Mirov ji hev dûr ketine. Me çand, perestgeh, pîr û rayberên xwe ji bîr kirine lê em ê belav nebin û têkiliyên xwe dîsa xurt bikin. Em ê çand û zimanê xwe fêrî zarokên xwe bikin. Ger mirov avê bidin darê wê dar fêkiyê bide." ***DÊRSIM***



# Kesên li gorî ruhê demê tevbigerin ew ê bi ser kevin

SALIH CUMA PÎR

Dewleta tirk dibêje ku ew ê bikevin rojavayê Kurdistanê. Yek hinceta wan heye; ew jî avakirina pergeleke demokratîk a kurdan e. Pergala yekemîn a demokratîk e ku kurdan bi hêza gel ava kiriye. Şoreşa Rojava ya demokratîk pêk hatiye. Tevlêbûna jinan û xizanan a rêveberiyê nîşane û peyitandina şoreşa demokratîk e. Şoreşa demokratîk a ku li vê derê pêk hatiye dê bibe bingeha demokratîkbûna Sûriyeyê. Hetta dê di demokratîkbûna Rojhilata Navîn de roleke girîng bilîze. Ji xwe tişta ku desthilata AKP-MHP'ê jê ditirse jî ev e. Naxwazin ku kurd di demokratîkbûna Rojhilata Navîn de bibin pêşeng. Çimkî ger kurd li Sûriyeyê statuya xweseriya demokratîk bi dest bixin, ew dizanin ku li Tirkiyeyê pergala faşîst û qirker nikare xwe li pêya bigire.

Rojavayê Kurdistanê ji bi gelhe û erdnîgariya xwe ji parçeyên Kurdistanê yê herî biçûk e. Ji aliyê polîtîk ve ji ber gelek sedeman bi hişmedîtir e û parçeyê herî zêde hesasiyetên neteweyî jî lê herî xurt in e. Ji ber ku wek civak bi tevahî di nav têkoşîne de cih negirtiye, belkî ji hêla kûrbûnê ve qels be lê di aliyê hesasiyeta neteweyî de peywirên ku ketine ser milê wan bi cih aniye. Her tim destek daye têkoşîna li parçeyên din ên Kurditanê. Di demên wan ên zor û zehmet de her tim hembêza xwe ji gelê me yên parçeyên din re vekiriye. Ji ber vê jî parçeyê ku herî zêde hişmendiya parçetiyê lê hetiye şikestin e. Gelê vê derê dizane ku di serî de bakurê Kurdistanê, azadiya wan di parçeyên din re derbas dibe. Lê belê çawa ku di 2011'an de li Sûriyeyê û Rojhilata Navîn alozî bi pêş ketin, ji bo azdiya Rojava jî derfet û fersend çêbûn û gelê Rojava û hêzên demokratîk jî ji vê rewşa nû sûd wergirtin û herêmên xwe rizgar kirin. Lê ev rastiyek e ku piştgiriya parçeyên din ên Kurdistanê ji bo azadkirina Rojava û bakurê Sûriyeyê girîng e. Bêguman di mercên siyasî yên heyî de polîtîkayên rast bên pêşxistin û têkoşîn bê dayîn derfetên misogerî û biewlekirina azadî û pergala demokratîk zêde ne.

Bêguman gelên Rojava û bakurê Sûriyeyê bi baweriya bi hêza xwe ya cewherî dê têbikoşin û herêmên xwe biparêzin. Lê belê berpirsyariya gelê me yê li parçeyên din û hêzên siyasî heye ku destek bide Rojava. Ger gel Rojava destek dabe têkoşîna gelê li parçeyên din dê di demên xwe yên zor û zehmet de gelê Rojava jî li benda piştgiriyê be. Lê li hemberî êrîşên dewleta tirk di serî de PDK, belkêş e ku hêzên siyasî yên li başûrê Kurdistanê bêhelwest in. Partiyên kurd ên ku bi awayekî tund bertek nîşanî gefên AKP-MHP'ê nadin divê bê vepirsîn. Gelê kurd, hêzên siyasî û ronakbîr ger bertek nîşanî vê rewşê nedin ji bo kurdan zeafiyeteke dîrokî dê derkeve holê. Kesên ku li rojavayê Kurdistanê xwedî dernekevin sibe roj ku êrîş li hemberî wan ji bûn mafê wan namîne ku li benda destekê bin. Gelo kîjan kurd dixwaze wiha bibe? Em li hemberî her du helwestan e jî. Helwesta hêzên Başûr nayê pejirandin. Êrîşî kîjan parçeyî bê kirin divê hemû parçe û hêzên siyasî wek ku li hemberî wan ev êrîş hatine kirin bertek bidin. Ger hişmendiyeke wisa ya kurdan çênebe ev dê bibe zeafeke mezin. Ji ber jî ne bêdengiya PDK'ê û ne jî ya hêzeke din a li hemberî êrîşên li dijî parçeyên din helwesteke ku nayê pejirandin e.

Biçûkbûna Rojava ya ji aliyê gelhe û erdnîgariyê ve berpirsyariyeke ehlakî li parçeyên din bar dike. Li ku dibe bila bibe hemû gel li hemberî parçeyên xwe yên biçûk bi berpirsyariyeke ehlakî tevdigerin. A rast bi gelê kurd re jî hesasiyeke wisa heye. Lê belê hêzên siyasî li heberî gefên li dijî Rojava vê hesasiyeta gel negirtin ber çavan.

Di helwesta hêzên ku di gotin koalîsyona li dijî DAIŞ'ê ne, li hemberî gefên li dijî Rojava de careke din xuya bû ku tu bawerî bi van hêzan nayê. Ji bo van hêzan tu nirxekî exlaqê siyasî, wijdan, heqaniyet û wefayê nîne. Ji bo wan a girîng, tenê berjewendiyên wan ên sar in. Gelên bakurê Sûriyeyê DAIŞ'ê têk dibe lê Tirkiye hewl dide ku vê rewşê weke gefekê li hemberî xwe bide qebûlkirin. Hemû cîhan dibêje ku bi têkbirina DAIŞ'ê re ewlehî û aramî tê Sûriyeyê lê Tirkiye berevajiya vê îdia dike. DYA û hêzên koalîsyonê jî vê îdiayê re dengê xwe nakin. Bi vê helwesta xwe jî ji hewldana xapandina raya giştî ya dewleta tirk re dibin alîkar. Tevî ku dewleta tirk rojane êrîşî Rojava dike jî ji ber vê sedemê rojane propagandaya ku Rojava êrîşî wan dike, dike. Di rewşa heyî de li şûna ku DYA û hêzên koalîsyonê li hemberî êrîşkaran helwest nîşan bidin, hewl didin ku şîretan li kesên rastî êrîşan tên, bikin.

Lê polîtîkayeke çiqas bêexlaq bê meşandin bila bemeşînin, têkoşîn û hêviya jiyaneke demokratîk û azad a rewa ya gelên Rojava û bakurê Sûriyeyê di lûtkeyê de ye. Hêzên ku ji têkoşîna gelên bakurê Sûriyeyê re dijminatiyê dikin, hêzên paşverû û riziyayî ne. Hewldana desthilatdariya AKP-MHP'ê ku dixwaze çeteyên El Nusra û hwd. weke hêzên rizgariyê nîşan bide û HSD'ê jî terorîze bike, ji hêla tu kesî ve nayê qebûlkirin. Ev hewldan tenê ya AKP-MHP'ê ye û dê bêencam be. Ne pêkan e ku AKP-MHP ya ku çeteyan di şer de bi kar tîne encamekê bidest bixe. Dibe ku kurd û gelên bakurê Sûriyeyê bedelên giran bidin lê di dawiya dawî de yên ku dê bi ser kevin hêzên azadî û demokrasiyê ne. Ger ku dîrok, di qezenckirina nirxên civakîbûn, dem û hemdemiyê de diyarker be, yên ku êrîşî bakurê Sûriyeyê dikin dê têk biçin.

Heke ku em li gorî nêzikatiya diyardeyî, pozîtîvîst û formel a hêzên serdest li wateya hêzê nenihêrin, li Rojhilata Navîn ku pergala dewletê ya 5 hezar salî û hevsengiyên moderniteya kapîtalîst û şerê sar ê 200 salî lê îflas kiriye, teqez dê serkeftin a hêzên xwedî hişmendiya neteweya demokratîk, civakparêz, azadî û demokrasiyê be. Dema ku vîna berxwedanê hat nîşandan, hêzên ku êdî dawiya wan hatiye dê teqez winda bikin. Şîfreya serkeftinê berxwedan, berxwedan û berxwedan e.

# Tu kes nikare şoreşa Rojava têk bibe

KCK'ê bi daxuyaniyekê da zanîn ku vekişîna DYA'yê parçeyeke komploya li dijî Rojava û bakurê Sûriyeyê ye û got ku dê tu hêz nekarin şoreşa Rojava têk bibe. Her wiha KCK'ê daxuyand ku dê bi hevsengiyên nû dagirkerî bê hilweşandin û got ku ew li cem gelê xwe ne

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê têkildarî biryara DYA'yê ya vekişîna ji Sûriyeyê daxuyanî da. KCK'ê ev biryar weke 'Operasyona xilaskirina desthilata faşîst a AKP-MHP'ê' pênase kir û da zanîn ku hevsengên nû dê bike ku dagirkeriya dewleta tirk hilweşe.

KCK'ê diyar kir ku bi biryara vekişîna Amerîkayê derketiya holê ku êrîşa dewleta tirk a li ser Rojava û bakurê Sûriyeyê komployeke e û parçeyeke jî lîstikê ye û wiha got: "Avaniya civaka demokratîk a rojayê Kurdistanê TEV-DEM'ê bi daxuyaniya xwe hemû rastî derxistiye holê. Ev rasteqînî hilweşîna siyasî, aborî û civakî ya di polîtîkayên Sûriyeyê de jî ya dewleta tirk a bi têkoşîna Tevgera Azadiya Kurd nîşan daye.Tirkiye dema ku ketî hilweşîna aborî DYA û Almanya ji bo ku ev pêk neyê gelekî hewl dane. Ji bo ku ji hêla siyasî ve jî destekê bidinê têkildarê sê pêşengên tevgera azadiyê fermana girtinê ye bi xelat hatiye girtin. Her wiha pergala demokratîk ku kurd, ereb, suryan û heman gelan li Rojava û bakurê Sûriyeyê danîne, polîtîkayên dewleta tirk ên li ser Sûriyeyê û Rojhilata Navîn têk birine. Dewleta tirk û çeteyên wê ketine çirava Sûriyeyê, ji bo ku xwe xilas bikin, berê xwe dane dagirkirina bakurê Sûriyeyê ku ji bo wan dê bibe çiraveke hîn xirabtir."

**Dê berxwedan hîn geştir be**

Di daxuyaniyê de hevserokatî destnîşan kir ku êrîşa dewleta tirk û vekişîna Amerîkayê dê vîna berxwedanê ya gelan geştir bike û wiha domand: "Destwerdana hêzên derve di wê mijarê de ku hêzên demokratîk bi hêza xwe û dînamîkên navxweyî, bi hêza xwe ya rasteqîn têbikoşin, dibû pirsgirêk. Ji bo vê jî, vekişîna DYA'yê dê encameke wiha bîne ku hemû hêzên demokratîk bigihîjin dînamîka hêzên xwe yên rastîn û zêdetir xurt bibin. Li bakurê Sûriyeyê şoreşa demokratîk dê bigihîje potansiyela xwe ya nû. Şoreşa Rojava û tevgerên şoreşger ên demokratîk ên li Sûriyeyê, bêyî hêzên derve derketine ser qada dîrokê, şoreşa demokratîk û têkoşîna azadiyê geş kirin. Ji bo vê jî, vekişîna leşkerên DYA'yê li Sûriyeyê dê têkoşîna şoreşê qels neke. Berevajiyê vê, dê bike ku polîtîkayên dewleta tirk ên ku li ser hevsengiyên derve avakirî û bi hebûna DYA'yê ya li Sûriyeyê, dixwest serwer bibe, hilweşîne. Çeteyên niha yên bi navê OSO'yê bi desteka DYA'yê ketine bin kontrola Tirkiyeyê. Destwerdana Rûsya û Sûriyeyê ya li ser Idlibê ku çete lê kom bûne, DYA'yê asteng kiriye. Ji ber vê jî, DYA bi vekişîna leşkerên xwe her çend rê li ber vedike ku dewleta tirk bakurê Sûriyeyê dagir bike jî, hevsengiyên nû yên ku derketine holê dê bike ku dagirkeriya dewleta tirk têk biçe."



**Tunekirina şoreşê tenê xeyal e**

KCK'ê ragihand ku vekişîna Amerîkayê beloqtir kiriye ku hêzên demokratîk ên li Sûriyeyê û pergala ku hatiye avakirin faktora girîng e ji bo aramî û aştiya Sûriyeyê û wiha pêde çû: "Derketina holê ya van rastiyan dê bike ku şoreşa Rojava ya ku xwe nespartiye hêzên derve û hêzên demokratîk ên Sûriyeyê zêdetir karîger bibin. Heke Tirkiye xeyal dike ku bi desteka DYA'yê û hin hêzên derve li ser erebên bakurê Sûriyeyê karîger bibe û bi destê hin nokerên kurd Şoreşa Rojava tasfiye bike, ev tenê dê xeyal be û tenê planeke li ser masê be."

**'Em li cem gelê xwe ne'**

Her wiha KCK'ê destnîşan kir ku ne tenê Amerîka di serî de Tirkiye divê hemû hêzên derve ji herêmê vekişin û got ku niha jî bo yekitiya demokratîk a Sûriyeyê metirsiya herî mezin desthilata faşîst a AKP-MHP'ê ye û wiha bi dawî kir: "Bi vê çarçoveyê em bang li hemû dînamîkên demokratîk ên Sûriyeyê dikin ev yekitiya ku li bakurê Sûriyeyê derketiye holê li hemû Sûriyeyê berbelav bibe û ne tenê li Sûriyeyê li hemû Rojhilata Navîn bibe bingeha xurtbûnê. Em weke Tevgera Azadiya Kurd, careke din diyar dikin em destekê didin ev yekitiya li ser hişmendiya neteweya demokratîk, li dijî êrîşeke em amade ne ku destekê bidin û têbikoşin." *BEHDÎNAN*



# Ji ber axaftina kurdî hat qetilkirin

Li Tirkiyeyê navçeya Hendek a Sakaryayê bav û kurê xwe yekşema borî bi sedema ku bi kurdî peyivîbûn rastî êrîşeke nijadperest hatibûn. Bav Kadir Sakçi (43 salî) ku bi giranî birîndar bûbû, jiyana xwe ji dest da. Kurê wî yê 16 salî Burhan Sakçi jî hîn li nexweşxanê tê dermankirin.

Hat ragihandin ku êrîşkar Hikmet Usta li bajarê Bursayê hatiye binçavkirin û ji polîsan re gotiye 'Tiştek nayê bîra min ez serxweş bûm'.

Her wiha çîroka êrîşa ser bav û kurên ji bajarê Mûşê wiha ye: "Kadîr Sakçi dema ku çûye kurê xwe Burhan ji berber bîne, kesekî bi navê Hikmet Usta (55 salî) û hevalên xwe nêzîkî wan bûne û rê li ber wan girtine. Dema ku dîtine bi kurdî diaxivin, êrîşkaran ji wan pirsiye; hûn kurd in an sûriyeyî ne? û piştî bersiva 'erê em kurd in' demançe derxistine û gule bi ser wan de reşandine." *SAKARYA*



# Leşkeran mala gund kir qereqol

Leşker û cerdevanên ku 16 roj in li mezraya Mala Evdo Heşkê Bît a gundê Nedarê ya Pasûra Amedê bi cih bûne, mala gund ji xwe re kirine qereqol. Nêzî 200 leşker û cerdevanên ku bi maşîneyên zirxî li gund bi cih bûne, bêyî ku destûr bigirin li mala gund bi cih bûne û kirine wekî qereqolê. Hat diyarkirin ku deriyê malê şikandine û leşkerên payebilind li vê malê dimînin û hat zanîn ku leşker û cerdevan ji 7'ê kanûnê ve li vir bi cih bûne û dar û berên gundiyan bê destûr dibirin. Welatiyên ku serî li rayedaran dan, diyar kirin ku tu bersiv negirtine û hêj leşker û cerdevan ji mezraya wan nehatine derxistin. *AMED*



# 'Zarokên we bên kuştin hûn ê çi hîs bikin?'

Di hefteya 717'emîn de Dayikên Şemiyê ji bo dîtina xizmên xwe yên ji hêla dewletê ve hatine windakirin û darizandina kujerên wan, li ber deriyê ÎHD'ê daxuyanî dan. Di çalakiyê de Dayikên Şemiyê aqûbeta xwendekarê Beşa Çapemeniyê ya Zanîngeha Marmarayê Îsmaîl Bahçecî pirsî. Di daxuyaniyê de birayê Bahçecî, Umut Bahçecî pirsa 'Zarokên we yên li zanîngehê dixwînin hene. Ger ku li welatê xwe bê kuştin hûn dê çi hîs bikin? Dê hişê we derkeve ne wisa?' kir û da zanîn ku ev 24 sal in birayê wî ji hizra dayika wî naçe.

Ji aliyê din ve çalakiya Xizmên Windayan a Amed û Êlihê jî ji bo dîtina windayan û darizandina kujeran vê heftê jî berdewam kir.

Li Amedê malbatan di hefteya 515'an de aqûbeta Huseyîn Yeşîmen ku di sala 1993'an de li Cizîra Şirnexê hat windakirin, pirsîn. Li Êlihê jî malbatan di hefteya 421'emîn de aqûbeta Îzzet Seven ê ku di sala 1998'an de hat windakirin pirsîn.

Her wiha di çalakiyan de malbatan diyar kirin ku heta widahiyên wan bê dîtin û kujerê wan bê darizandin dê çalakiyên xwe bidomînin. *AMED - STENBOL*

# Tekane rê heye ew jî şikandina tecrîdê ye

Çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger a ku hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven li Girtîgeha Tîpa E ya Amedê ji bo rakirina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daye destpêkirin, ket roja xwe ya 46'an. Bi heman daxwazan, girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê jî di 16'yê kanûnê de dest bi çalakiya bêdem û bêdorveger kirin.

Di vê çarçoveyê de koma destpêkê bi tevlêbûna 30 girtiyan dest bi greva birçîbûnê kiribûn. Tê payîn ku koma duyemîn dê di 26'ê kanûnê de û koma sêyemîn jî di 5'ê çileyê de dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger bikin. Ji bo piştgiriya bi çalakiya Guven re, girtiyên siyasî yên li Girtîgeha Tîpa T ya Siwêregê û Girtîgeha Tîpa T a Jimar 2 ya Rihayê jî xwe amade dikin ku di 5'ê çileyê de dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger bikin.

**Nameya girtiyan**

Têkildarî mijarê girtiyan name şand û ev tişt parve kirin: "Bi vê armancê jî em dê bi komên ji 7 girtiyan pêk tên, ji bo 10 rojan çalakiyên xwe yên grevên birçîbûnê didomînin. Berî vê 2 kom ketibûn greva birçîbûnê. Niha jî koma me ya 3'yemîn çalakiyê berdewam dike. Ger ku rewşa wisa bidome em ê bi komek nû dest bi çalakiya xwe ya greva birçîbûnê bikin. Em dibêjin ku yan em ê tecrîdê bişikînin, an em ê tecrîdê bişikînin. Tu rêyek din tune ye. Em bi biryar in ku heya dawiyê biçin." *RIHA*



CÎHAN
23 Kanûn 2018 Yekşem



## Li Somaliyê du teqînên bombeyî çêbûn

**MOGADÎŞU -** Li paytexta welatê Somalî Mogadîşuyê di encama du êrîşên mezin ên bombeyî de, bi kêmanî 5 kesan jiyana xwe ji dest da û 4 kes jî birîndar bûn. Hat ragihandin ku rêxistina Eş Şebabê ev êrîş pêk anîne û berpirsyariya her du êrîşan jî girtiye ser xwe. Li gorî zanyariyan dibe ku hejmara mirî û birîndaran zêdetir bibe. Ji beriya niha bi demekê êrîşek biribûn ser gelê sivîl û gelek kesan jiyana xwe ji dest dabû. Lê belê tu rayedaran nerazîbûn û daxuyaniyek nedabû ku çima êrîşek bi vî rengî pêk hatiye.



# Îran bûye girtîgeha rojnamegeran

Rêxistina Rojnamegerên Sînornenas nameyek ji Komîseriya Bilind a Netewên Yekbûyî re şand. Di nameyê de hat xwestin ku demildest li Îranê rê li pêşiya girtin û binçavkirina rojnamegeran were girtin. Di sala 2018'an ve zêdetirî 40 rojnameger hatine binçavkirin

Rêxistina Rojnamegerên Sînornenas (RSF) nameyek ji Komîseriya Bilind a Netewên Yekbûyî (NY) re şand. Di nameyê de Komara Îslamî ya Îranê bi girtina rojnamegeran a ji derveyî zagonan tê sûcdarkirin. Her wiha di nameyê de tê gotin ku rojnamegerên tên girtin nayên dermankirin, rojnameger di dadgehên dadperwer da ne nayên dadgehkirin, her wiha hemû pîvan û mafên ku di danezana cîhanî ya mafê mirov de ji bo mafê kesên sivîl û siyasî heyî ve tên binpêkirin.

Di nameyê de hejmara rojnamegerên ku li Îranê hatine girtin jî tê aşkerakirin. Li gorî nameyê tê gotin ku ji destpêka sala 2018'an ve zêdetirî 40 rojnameger hatine binçavkirin.

Hinek ji van rojnameger bi kefaletek mezin heya roja dadgehkirinê hatine berdan, li 13 rojnamegeran cezayê girtîgehê hatiye birîn. Cezayê wan ji 3 salan dest pê dike heta 26 salan... Her wiha 28 rojnamegerên din jî di girtîgehên Îranê de ne ku salên borî hatine girtin.

Di beşeke din a nameyê de girtin û binçavkirina çalakvanên dîwarên cuda de li Îranê, bi ne yasayî û karekî ne dadperwerane bi nav kirine.

Hêjayî gotinê ye ku ji beriya niha jî Rêxistina Rojnamegerên Sînornenas di rapora xwe ya li ser rewşa rojnamegeran de, Îran wekî yek ji 5 girtîgehên mezin ên ji bo rojnamegeran bi nav kiribû. *TEHRAN*





## Dixwazin axa Sûriyeyê qut bikin



**ŞAM -** Rojnameya El Ereb jî behsa gefên Tirkiyeyê kir û got: "Tirkiye bi awayekî aşkera hewl dide beşek ji axa sînorê hundir a Sûriyeyê qut bike û têxw bin serweriya xwe. Bi vê yekê Tirkiye bi vê yekê hewl dide bi dagirkirina yekser an jî hêzên girêdayî xwe li wir bi cih bike û kurdan ji wir derxe. Her wiha dixwaze guhertina demografîk pêk bîne û bi hezaran ji koçberên Sûriyeyê (Erebên Sinî) li wê herêmê bi cih bike. Dewleta tirk li Efrînê jî ku bi desteka komên muxalif kire bin serweriya xwe, polîtîkayên koçberkirina bi darê zorê ya kurdan û guhertina demografîk pêk anî."

## Îranê êrîşî keştiyên DYA'ê kir



**TEHRAN -** Li gorî zanyariyên Associated Pressê derengê şeva pasdarên Îranê dema keştiya şer a Amerîkayê ya şer a bi navê USS John Ci Stennis derbasî kendava erebî bûye. 30 keştiyên Îranê jî li dora wê bûne û tê gotin ku ji keştiyeke Îranê ceribandina moşekî pêk hatiye û moşek nêzîkî keştiya Amerîkayê ketine. Keştiya şer a Amerîkayê piştî ku Amerîkayê xwe ji rêkeftina atomî ya li gel Îranê vekişand, ji avên kendava erebî re hat rêkirin.

## Li Yemenê 18 Hûsî hatin kuştin



**SANA -** Li Yemenê li bajarê Daliyê di şerê navbera artêşa Yemenê û Hûsiyan de, 18 kesên Hûsî hatin kuştin û 12 kes jî birîndar bûn. Li gorî malpera înternetê ya artêşê "September Net" û Hûsî xwestin bikevin nav çeperên artêşê. Hat gotin ku Hûsiyan şer nekiriye û çeperên xwe berdane. Ev di nav gel de bû sedema metirsiyê. Piştî ku şer derket hêzên Hûsî çeperên xwe berdan. 7 navçeyên Daliyê di bin kontrola artêşê Yemenê de ne. Li ser vê gel ji rayedaran xwest ku piştgiriya rizgariya wan were kirin ku bikaribin ji destê wan werin rizgarkirin. Li ser vê hîn jî ji bo rizgarkirina gel kesek daxuyaniyek nedaye ku wê bên rizgarkirin an na.

# Li Yemenê agirbest hat pejirandin

Meclisa Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî bi giştî biryara belavbûna tîmeke navdewletî li herêma El Hudeydayê ya Yemenê ji bo şopandina agirbestê erê kir.

Piştî diyalogên aştiyê ku bi sponseriya Neteweyên Yekbûyî (NY) li Swêdê hatin lidarxistin, koma Ensarellah El Hûsî ya ku alîkariya xwe ji Îranê werdigire û hikûmeta Yemenê ku destekê ji Erebistana Siûdî werdigire, biryara agirbestê li bajarê Yemenê û vekişîna hemû hêzan, erê kir. Hêjayî bibîrxistinê ye ku roja sêşemê agirbestê dest pê kir.

Neteweyên Yekbûyî, sekretêrê giştî yê NY`ê Antonio Guterres erkdar kir ku di nav mehekê de tîmekê ji bo şopandinê û alîkariya di navbera her du aliyan de ava bike. Li gorî Reutersê ku Guterres di dawiya mehê de pêşniyar der barê xebatên şopandinê yên sereke, agirbest, ji nû ve belavkirina hêzên her du aliyan, destekdayîna rêveberî û şopandina rawestgehên deryayî yên El Hudeyda, El Selîf û Ras Îsa û xurtkirina hebûna NY`ê li herêma El Hudeydayê de xwest.

Tê payîn ku Guterres raporeke heftane der barê pêkanîna biryarê de jim meclisa elehiyê re pêşkêş bike. Nûnera Brîtanyayê li NY`ê Karen Pierce piştî dengdayînê ji meclisê re got: "Divê hemû alî li gorî hevpeymanên xwe tevbigerin." Ji ber şer, li Yemenê rewşa birçîbûnê derket holê. Bi milyonan gelê Yemenê li benda alîkariyan e. Pirahiya hawirdeyên Yemenê di ser El Hudeydayê de derbas dibûn lê ev yek bi awayekî berbiçav kêm bûye. *SANA*





## Amerîkayê ji Rûsya û Tirkiyeyê çi xwest?



Wezîrê Karên Derve yê Amerîkayê Mike Pompeo li ser biryara vekişîna leşkerên Amerîkayê ya ji Sûriyeyê wiha diyar kir ew hêvî dikin ku Tirkiye û Rûsya berpirsiyariyên xwe yên ji bo biryara Konseya Ewlekariya Neteweyên Yekbûyî (KENY) pêk bînin.

Pompeo di axaftina xwe ya radyoya NPRê de, bal kişand ser biryara KENY'ê ya bi jimar 2254 a çareseriya siyasî ji bo krîza Sûriyê û got, "Em hêvî dikin Tirkiye û Rûsya berpirsiyariyên xwe yên bo biryara Konseya Ewlekariya Neteweyên Yekbûyî (KENY) bi cih bînin. Dê Amerîka hewldanên xwe yên dîplomatîk bidomîne."

Berdevka Koşka Spî Sarah Sandersê li ser pirsên biryara vekişînê ya Trump gotibû, ew digel ku ketine qonaxeke nû ya têkoşîna li dijî DAIŞê, wan dest bi vekişandina leşkerên xwe kirine. *WASHÎNGTON*

## Tirkiye û Yewnanistan gefan li hev dixwin

Li ser xwedîtiya giravan nakokiyên wan hene Wezîrê Berevaniya Tirkiyeyê Hûlûsî Akar bersiva artêşa Yewnanistanê da got kesek nikare me ji giravê derxe!

Çend roj berê fermandarê giştî yê artêşa Yewnanistanê Evangelos Apostolakîs bi tundî Tirkiye gef kiribû û gotibû, ger hêzên Tirkiyeyê gavekî derbasî nav giravên me bibin em ê wan bi erdê re bikin yek! Wezîrê Berevaniya Tirkiyeyê Hûlûsî Akar, li Afganistanê bersiva Apostolakîs da û ragihand, bila Yewnanistan dev ji sorkirina Tirkiyeyê berde û hişê xwe bide serê xwe. Eger na, dê rastî bersivek tûj were. Nêzîkî 100 salan in Tirkiye û Yewnanistanê li ser xwedîtiya 12 giravên biçûk yên li deryaya Egeyê de nakok in. *ATÎNA*



www.arsivakurd.org



## Nêweşxane de raştîya birînê lewê xo musa

**BALIKESÎR –** Yahya Gurelo 70 serrî ke Balikesîr de cuyeno, 6 aşmî verê cû lewê ci de birînêko şenik vejîya. Gurelî nêşî doktor û eczane ra merhemêk girewt, la çiqas şî birînê lewê ci vila bî. Gurelî şî keyeyê kênayanê xo yê ke Stenbol de ronişenî û Nêweşxaneyê Çamlica yê Medîcana de Beşê Goş û Zincî ra Doç. Dr. Zafer Çiftçi teşhisê 2.5 santîm tumor rona Gurelî. Tumor verê ke bibo rîşa merdimwer û vila bibo dormeyê milê Gurelî bi operasyonêko cerrahî ke 3 saet dewam kerd, ame girewtiş.



# Pêşnîyazê ke nêweşîya zerrî de yenî kerdiş

MERKEZÊ XEBERAN



Seba pawitişê weşî û nêweşîyê damarê zerrî, ganî merdim wayîrê kîloyêko îdeal bibo. Cok ra ganî merdim stîlê cuya xo bibedilno û bi xidayanê sivikan tercih bikero. Derheqê babete de Beşê Dîyet û Werdî yê Nêweşxaneyê Dîcle Memorîalî ra Dyt. Dîlek Çîçeke qisey kerde û hetê pawitişê zerrîye û werdî de malumatê muhîman daye.

Dyt. Dîlek Çîçeke destpêkê qiseykerdişê xo de bale ante muhîmîya bedilnayîşê stîlê cuye û wina va: "Stres, cuya bê têgêrayîş, cixara, dîyabet, obezîte, hîpertansîyon, kolestorolo berz, û sewbîna çîyî benî sebebê nêweşîyê zerrî. Roja ma ya ewro de se ra 25ê nufusê pêroyê dinya binê tehlukeyê nêweşîyê damarê zerrî de yî. Welatê ma de nêweşîya damarê zerrî goreyê pêroyê dinya hîna zêde yena dîyayîş û pêroyê mergan de se ra 47,73 sebebê mergan o.

***Xidayê teze û rûnê zeytunan ra feyde bigêrên***

Dyt. Dîlek Çîçeke dewamê qiseykerdişê xo de qala faktorê genetîkî ke merdim pê nêweşîya zerrî keweno kerde û va: "Her çiqas ke sebebê faktorê genetîkî neweşîye de bi tesîr bibî zî, nêweşîye ra pawitiş reyna girêdayeyê werdî ya. Werdê bêserûber beno sebebê averşîyayîşê nêweşî û rîskê cuye. Zerrîya merdim bi werdê serûber yena pawitiş. Sewbîna badê ke merdiman de nêweşîya zerrî vejîyeno zî werdê biserûber zaf muhîm o. Eke kontrolê nêweşî baş bêro kerdiş, nêweş eşkeno agêro cuya xo ya verên. Dinya de çîyo ke tewr zêde muhîmî dîyeno ci werdê biserûber o."

Dyt. Dîlek Çîçeke tewr peynî wina va: "Yanî stîlê werdê Akdenîz o. Stîlê werdê Akdenîzî; zad, beqlayê huşkî, sewzeyê teze, fekî, mase û rûnê zeytunan î. Werdê şik û goştî zî hîna kêmî yî. Stîlê werdê Akdenîzî de çîyê ke her roje bêrî werdiş nê yî; zad, sewze, fekî, beqlayê huşkî, şit û çîyê şitin î. Yeno pêşnîyazkerdiş ke hewte de reyêk ya zî di rey mase, kerg û hakî bêrî werdiş. Goştê sûre zî ganî aşmêk de reyêk ya zî di rey bêro werdiş. Ganî werd û pewtişê werdî de zî rûnê zeytunan bêro tercihkerdiş."

***Bala xo bidêne nê pêşnîyazan û nêweşîyê zerrî ra xo bipawên***

***1.*** Stîlê werdê Akdenîzî ganî bibo stîlê cuye.

***2.*** Ganî mîyanê roje de 3 werdê sereke û 3-4 werdê maben bêrî werdiş.

***3.*** Ganî merdim bogacayê ke mîyanê ci de Glîsemîk îndeksî estî, qurabîye, nanê sipî, şekirê basit û şekerê çayî ke lazimîya bedenê merdiman bi înan çin a û benî sebebê berzbîyayîşê şekerê gonîya anî ra dûrî bivindero.

***4.*** Ganî rûnê boç, postê kerg, rûnê goştê sûre, rûnê kele û sakadatî tay bêrî werdiş.

***5.*** Heme hucreyê bedenê merdimî muhtacê awe yî û ganî roje de 2-2,5 lître awe bêfra şimitiş.

***6.*** Ganî wextê werdî 15-20 deqayan derbaz nêkero û werd baş bêro çinitiş.

***7.*** Ganî merdim hetê saetê hewnî de dîkkat bikero û roje de 6 saetî ra heta 8 saetan rakewo.

***8.*** Ganî çîyê Sûrekerde, qawirme û sewbîna çîyê winasî bêrî teriknayîş.

***9.*** Alkol kêm bêro şimitiş.

***10.*** Ganî sol tay bêro werdiş. Rojêk de lazimîya sole 5 gram a. Ganî nan û salçe ra lazimîya sole bêra temînkerdiş.

***11.*** Ganî heme çîyê ke zerrî merdimî şêro ci nêro werdiş. Ganî goreyê zerrîya xo nê, goreyê lazimîya bedenê merdimî werd bêro werdiş.







# 5 xeletîyê ke derheqê hîpertansîyonî de sey raşt yenî zanayîş

MERKEZÊ XEBERAN



Nêweşê hîpertansîyonî Tirkîye de nizdîyê 15 mîlyon kesî. La encax nê nêweşan ra tena se ra 5-6ê ci tedawîya bi tesîr vînenî. Hîpertansîyon yeno mehneya basincê gonîya berzî û xeylê sebebê na nêweşîye estî. Nizdîbîyayîşê merdimatî û xerckerdişê sola zêde na nêweşîye de tesîrêko pil kay kenî. Se ra 95ê nêweşan de sebebê tansîyono berz nîno vînayîş û zanayîş.

Babete ser o Beşê Kardîyolojî yê Nêweşxaneyê Dîcle Memorîalî ra Uz. Dr. Cegerğun Polatî qisey kerd û derheqê hîpertansîyonî de çîyê ke xelet yenî zanayîş vat.

***Zirar dano damar û organê zerreyan***

Uz. Dr. Cegerğun Polatî destpêkê qiseykerdişê xo de wina va: "Hîpertansîyon, wextê şîyayîşê gonî de basinco ke dêsê damarî de beno yo. No tesîr, wextêko derd de zirar dano mîyanê damaran. Tansîyono berz vera damarê ke organan miqate kenî de xetimîyayîş, hîrabîyayîş û çirîyayîş vejîyenî raşte. Na rewşe organan de şîyayîş û ameyîşê gonî xira kena û bena sebebê qîmînêbîyayîşê organan."

***Xeylê çîyî sebebê hîpertansîyonî yî***

Uz. Dr. Cegerğun Polatî dewamê qiseykerdişê xo de dîyar kerd ke hîpertansîyon beno ke nêweşîyê tîroît, tumorê bezê serê loqere, dengbîyayîşê damarê ke şonî loqere, tengbîyayîşê aort, xirabîyayîşê genetîk, obezîte, sola zêde û alkolî de xo bido teber û wina dewam kerd: "Hebê kontrolê bîyayîş û tewirê hebê ke dejê merdiman benî zî beno ke bibî sebebê berzbîyayîşê basincê gonî. Nêweşan de sebebê hîpertansîyonî nêro zanayîş zî ganî bigîrîyo binê kontrol û bikewo peymeyo îdeal 12/8î."

***Dermanan biserûber girewtiş muhîm o***

Uz. Dr. Cegerğun Polatî da zanayene ke hîpertansîyon de tedawîya tewr bi tesîrin biserûber girewtişê dermanan o û wina domna: "Bin kontrolê doktor de biserûber dermangirewtiş zaf muhîm o. Roja ma ya ewro de tedawîya bi tesîrin û alternatîfê dermanê cîya ke tesîrê xirab zaf kêmî yî zî estî. Ganî nêweşî hetê tesîrê dermanan de malumat bidî doktorê xo û malumatdayîş zaf muhîm o. Ganî dermanê nêweşî bê qerarê doktor nêrî veradayîş. Eke problemêk bibo zî muracatê doktorê xo bikerên."

***Bedilnayîşê stîlê cuye serkewtişî hîna zêde keno***

Uz. Dr. Cegerğun Polatî qiseykerdişê xo yê peyênan de wina va: "Tedawîya dermanan de bedilnayîşê stîlê cuye tesîroko gir virazeno. Seba kîlodayîşî, ganî merdim dîyet bikero, têgêrayîş û egzersîz zî bikero tarzê cuye, peymeyêko tewr kêmî de sol biwero, cixara û alkol nêrî şimitiş û stres bêro kontrolkerdiş. Nê quralî, qelîteyê cuye berz kenî û tedawî de peymeyê serkewtişî zêde kenî."

***Prosesê tedawî de bala xo bidêne nê pêşnîyazan…***

***1.*** Hîpertansîyon de cayê lîmon û sîrî çin o. Ganî nêweşî dermananê xo biserûber bigîrî û seba weşîya xo nê werdan nêwerî.

***2.*** Bawerîya ke dermanê hîpertansîyonî merdiman kenî dermanbest temamî xeletî. Ganî tedawîya hîpertansîyonî daîmî biba.


***3.*** Dermanê ke tansîyon fînenî loqere û qeseba sîya de hema merdimam vajo qet tesîrê înan çin î, tay o. Basincê gonîya berz sere de loqere û xeylê organan de wexto ke bi derman nêro dermankerdiş vejîyeno. Tedawînêbîyayîşê hîpertansîyonî zaf rîskin o.

***4.*** Hîpertansîyon nêweşîya ke temamî raşte ra wedarîya nîya. Wexto ke tansîyon bigîrîyo bin kontrol nêweş vanê 'ma weş bîyî' û dermanan vera danî. Ganî wina nêro kerdiş û bin kontrolê doktor de tedawî bêra dawamkerdiş.

***5.*** Komel de vanê qey hîpertansîyon nêweşîya extîyaran a. No xelet o. Roja ma ya ewro de hîpertansîyon ciwana de zî yeno dîyayîş û xeylê sebebê ci yê cîyacîya estî. Merdimê 20-30 serrî de se ra 10-15 û 50 serrî ra cor de zî se ra 30-40 nêweşîya hîpertansîyon yena dîyayîş.

Nêweşê hîpertansîyonî Tirkîye de nizdîyê 15 mîlyon kesî. La encax nê nêweşan ra tena se ra 5-6ê ci tedawîya bi tesîr vînenî. Beşê Kardîyolojî yê Nêweşxaneyê Dîcle Memorîalî ra Uz. Dr. Cegerğun Polatî qisey kerd û derheqê hîpertansîyonî de çîyê ke xelet yenî zanayîş vat





www.arsivakurd.org

# Bi wêneyan bêrîkirina Efrînê

**Ahrîman Hesen mamosteyê wênesaziyê ye. Pîşeya xwe bi xêzkirina çend wêneyên hêsan dest pê dike û piştre wêneyên dîwarî yên ku rengên wan bêrîkirina welatê dagirkirî Efrînê dinimînin, xêz dike**






Cafer CAFO - Xandî ELO / ŞEHBA - ANHA

Encamên şer û dagirkirinê gelekî xirab in. Şênî gelek caran bê hêvî dimînin û bi bedbînî jiyana xwe didomînin. Lê şêniyên Efrînê bi vîn û xweşbîniya xwe ew rewş berovajî kiriye û hêviyên xwe jî qut nekirine.

Ahrîman Hesen di temenê xwe yê biçûk de ji wênesaziyê hez dike û biryar dide ku xwe bi pêş bixe. Piştî qedandina hemû astên xwendinê, derbasî peymengaha hunera wênesaziyê dibe.

Hesen beriya dagirkirina Efrînê, di dibistanên Efrînê de mamosteyê wênesaziyê bû. Piştî dagirkirina Efrînê di 18'yê adarê de, Hesen mîna bi hezaran şêniyên Efrînê neçar dimîne ji warê xwe derkeve û li Şehbayê bi cih dibe.

Ruxmî şert û mercên koçberiyê yên dijwar jî Ahrîman di fêrkirina xwendekaran de babeta wênesaziyê li Şehbayê bi israr e.

Ahrîman ji bo ku karibe hestên bêrîkirina welatê xwe yê dagirkirî Efrîn rave bike, li ser dîwarên dibistanên Şehbayê gelek wêneyên ku hestên wî rave dikin, xêz dike. Van wêneyên dîwarî bala xwendekaran jî kişand. Derfetên kêm li ber daxwaza Hesen nebûn asteng. Hesen tevî 6 xwendekaran komekê ava dike û bi pênûsa rengê reş dest bi xêzkirinê dike. Di dirêjahiya du mehan de dixebitin û 3 nexşeyên dîwarî xêz dikin.

Mijara nexşeya yekemîn sembolîk e û tê de periyek ku pifî ba dike, da ku peyva 'Efrîn' xêz bibe hatiye xêzkirin. Ya duyemîn jî girêdayî notayek muzîkê ye ku ji dûvê hespekî dest pê dike û ew notaya sirûda Ey Reqîb e. Di nexşeya dîwarî ya sêyemîn de Zerdeşt hatiye xêzkirin.

Der barê mijarê Ahrîman Hesen wiha got: "Ji biçûkahiya xwe ve ez ji wênesaziyê hez dikim û min ji xwe re kir arezû. Piştî ku ez ji peymangehê derçûm, tê de bûm pispor û min dest bi fêrkirina hunerê ji xwendekaran re kir. Beriya dagirkirina Efrînê ez tev li gelek çalakiyên hunerî bûm. Di dagirkirinê de dibistan wêran bûn û wê jî bandoreke neyînî li derûniya xwendekaran kir. Tevî derfetên kêm me dest bi xêzkirina wan berheman kir û hestên xwe rave kirin."

Ji aliyê xwe ve xwendekara bi navê Ceylan Elî jî wiha axivî: "Ji bo xweşikkirina xuyenga dibistanan, me dest bi xêzkirina wêneyan kir. Piştî 2 mehan me 3 wêneyên dîwarî yên sembola dîroka kurdan bi dawî kirin."

# Cejna pêşwazîkirina sala nû

Necla DEMÎR / STENBOL - MA

"Gaxend" ku ji aliyê hin gelên Mezopotamyayê ve û li herêma Dersimê tê pîrozkirin, di hefteya sisêyan a meha kanûnê de dest pê dike û heta hefteya ewil a meha çileyê dewam dike.

Hêla herî girîng a "Gaxendê" ew e ku ji bo di sala nû de tiştên xerab neqewimin hin rîtuel tên kirin. Ger navbera cîranan nebaş be li hev tên, ji bo miriyan niyaz tê belavkirin. Her wiha hin kes di vê mehê de rojiyê jî digirin. Lê belê Gaxaend a ku wekî cejnê tê pîrozkirin ji bo jinan xwedî wateyeke cuda ye. Di vê mehê de jinên elewî û yên din tên cem hevdu û loqme û xwarinên herêmî yên bi awayekî palûteyî çêdikin bi hev re parve dikin. Beriya loqme bên belavkirin ana li ser dixwînin. Piştî vê xwarin tên parvekirin û belavkirin. Li Taksîmê jinên di bin banê Navenda Lêkolînan a Dersimê de tên cem hevdu, behsa Gaxendê kirin.

Endama Navenda Lêkolînan a Dersimê Songul Şahîn, bilêv kir ku li gor baweriya wan Gaxend tê wateya verêkirina sala berê û got: "Her wiha tê wateya pêşwazîkirina sala nû jî. Di nav gelek baweriyan de Gaxend heta roja niha dewam dike. Helbet em tenê wekî rîtulekê nêzî wê nabin. Hemû bawerî li gor rastiyan û paralelî hev heta niha hatine. Me ew rastiya ku ana û dedeyên me ji me re vegotin anî roja îro. Yanî em ewladên zimanê aştiyê, heqiyê û rizayê ne. Ji bo me Gaxend tê wateya ku bîra bi destê dayikê çêbûye."

Şahîn, diyar kir ku jinên ji bo Gaxendê tên gel hev dibin sedema jiyaneke komunal jî û got: "Wexta em tên cem hevdu, her yek ji me bi tiştên xwe yê ji malê aniye tev lê dibe. Ne tiştên kapitalîzmê berpêşî me kirine, tiştên em bi awayekî palûteyî çêdikin. Em duayên xwe dixwînin û çirayên xwe pêdixin. Çira ji bo me jiyan, hêvî, yekîtî, av, evîn û her tişt e. Lê wekî yekûn hevkariya baweriyekê ye jî. Ji ber em jin vediguhêzînin, em bawerî û nirxên xwe di dilê xwe de bi cih dikin û vediguhêzînin siberojan. Em wekî xwarin û vexwarinê li Gaxendê nanihêrin, em di çarçoveya komunaliyê de lê dinihêrin. Em bi vî awayî jî ji zarokên xwe re vedibêjin."



Fîlor Ûlûk a ermen jî ji bo Gaxendê got: "Em ermeniyên Ortodoksê di 5'ê çileyê de Gaxendê pîroz dikin. Li cem me wateya Gaxendê Hîsûs e yanî roja jidaykbûnê ya Îsa ye. Loma ji bo me cejna herî mezin e. Wekî Noelê jî tê bilêvkirin, lê belê hin xirîstiyan di 25'ê Kanûnê de pîroz dikin, lê em ermenên Anatolyayê di hefteya ewil a çileyê de pîroz dikin. Hinar ji bo me pir girîng e. Di sala nû de hinar tên teqandin. Hem ji bo ew êş neyê jibîrkirin hem jî ji bo bereketê tê belavkirin."

## Bi kurdî online jî bixwînin


AG-Kurdish di encama karê xwe de ji sala 2011´an ve çend pirtûkên ji bo zarokên kurd du zimanî amade kirine. Ev pirtûk ji bilî dersdar û mamosteyan, bi awayê xwe yê online dikarin li her derê bên xwendin.

Projeyên nivîsandina pirtûkên du zimanî li Almanyayê dema mijar kurdî be, ya rastî kêm in, lê hene. Ji ber ku ji bo zarokên kurd hebûna materyalên du zimanî li dergûşxane, baxçeyên zarokan û dibistanan jiyanî ne, ev proje jî hêja ne ku qet nebe qala wan bê kirin. Yek ji van projeyan navenda wê li paytexta Almanyayê Berlînê ye û di encama xebatên di çarçoveya AG-Kurdish de derketiye holê.

"Xwendin Ronahî Ye" navê yekê ji projeyên Komeleya Dêûbavên ji Kurdistanê ya li Berlînê YEKMAL e. V.´yê û Înstîtûta ji bo Ziman û Çanda Kirmanc (Zaza)-IKK e.V. ye. Projeyê AG-Kurdisch (Koma Xebatê ya Kurdî) bi rê ve dibe. Di nava projeyê de ji bilî her du saziyan, 3 pedagog cihê xwe digirin. Alan Dilpak ji bo kurmanciyê pedagog e, Lerzan Jandil ji bo kirmanckiyê pedagog e û Barbara Foltz jî ji bo almanî pedagog e. Armanca projeyê ew e ku materyalên fêrbûnê yên du zimanî ango bi kurdî û almanî hilberîne. Ji ber wê jî slogana wê ya "Xwendin Ronahî Ye" hem bi kirmanckî (Wendene Roştî Ya) û hem jî bi almanî derdikeve pêş.

**Ji bo zarokên kurd e**

Di danasîna projeyê de tê gotin "Ji karên YEKMAL´ê yên bingehîn yek jî ew e ku ji bo fêrbûn û pêşxistina zimanê dayikê ji bo zarok û ciwanan hewl bide, ji bo ku wan zana û serpêhatiyên xwe li ber hev bigirin, da ku zimanê xwe yê dayikê bi serketî bi kar bînin. Ev jî şertek e ku zarok û ciwan baştir fêrî zimanên din bibin. *BERLÎN*



## Kulîlka pêşî beriya bi 174 milyon salî vekiriye

Hate diyakirin ku kulîlka pêşî li cîhanê beriya bi 174 milyon salî vekiriye.

Nebat ji mêj ve derketine holê. Celebên algan ên beriya milyarek sal e hene. Nebatên bi kulîlk dereng xuya bûne. Beriya bi demeke ne dereng kulîlka herî kevn bi navê 'Montsechîa vîdalîî' dihate zanîn. Ev kulîlk beriya bi 130 milyon salî xuya kiriye.

Li gorî analîzên nû yên genetîk kulîlka pêşî beriya bi 140 milyon salî vekiriye. Li gorî keşfa nû agahiyên têkildarî kulîlka pêşî şaş in. Ji ber ku kulîlka pêşî ya bi navê "Nanjînganthus dendrostyla" 174 milyon sal berê vekiriye.

Ev kulîlk ji hêla Akademiya Zanistên Çînî Nanjing ve hate keşfkirin. Tîma Çînî li herêma Nanjîngê li ser latan lêkolîn li ser 250 fosîlên nebatan kir. Bi teknîka mîkroskobîk lêkolîneran diyar kirin kulîlka "Nanjînganthûs dendrostyla" nebateke kulilkî ye û bi tov e. *AMED*



## KELEHA RABATÊ

Li Erdêxanê, hema li ber gundê Rabatê yê ser bi navçeya Çildarê, li aliyê herî bakur ê Kurdistanê, kelehek heye. Ev keleh ji serdema Helenîk maye û heta bi serdema Osmaniyan jî hatiye bikaranîn. Ji ber ku xelkê derdorê bawer dikin rukekî necis li wan derab hatiye dîtin bi navê Keleha Necis navdar e. *ERDEXAN*